## Gelo ez dê ji encamên testa xwe agahdar bibim?

Eger hûn bixwazin, di nav du hefteyan da hûn dikarin encamên testê ji laboratîfê bistînin.

Di saetên kar da werin navenda lêkolînê, ku bijîşkê we dê encamên testa we bide we.

Eger hûn tûşî Hepatît B, C an jî D bin, dê gavên we yên din û vebijarkên tedawîyê jî bên nîqaşkirin û li nivsîngeh we serdanek dikare pêk were.

Eger we sîgorta Elmanî ya derbasdar a tenduristiyê tune be, dê li nivsîngeh kontrolê serdanê were destnîşan kirin. Ew dê kontrol bikin ka hûn dikarin sîgortaya tenduristîyê bistînin an na.

## Eger ez beşdar bibim ez dê çi bidest bixim?

- Hûn ê li ser hepatît B, C û D yê da agahîyên balkêş bistînin.
- Eger hûn bixwazin, piştî 14 rojan hûn dikarin encamên testê ji navenda lêkolînê berhev bikin.
- Eger test erênî be, bijîşkê we dê encaman bi we ra nîqaş bike û di gavên din da ji we ra şîretan bike.
- Hemû beşdar 10 Euro werdigirin.


**Eger pirsên we hebin, ji kerema xwe bi tîma lêkolînê re bikevin têkiliyê:**
**Email: HepMig@rki.de**
**Telefon: 0178 - 97 51 912**

## Ez li ku û kengî beşdar bibim?

- Hewceyî bi qeydkirinê nîne
- Wergêrê ziman tê radestkirin!

**Ji 4-ê Gulanê heta 16-ê hezîrana 2023-an**
**Navenda Lêkolînê ya Beşa Tenduristiyê ya Frankfûrtê**

| Dema xebatê: | | Navnîşan: |
|---|---|---|
| Duşem | 8:00 – 13:00 | Zeil 5, Qata 2yemîn |
| Sêşem | 16:00 – 20:00 | Breite Gasse 28, Qata Yekem |
| Çarşem | 16:00 – 20:00 | Breite Gasse 28, Qata Yekem |
| Pêncşem | 8:00 – 13:00 | Zeil 5, Qata 2yemîn |
| Înê | 8:00 – 17:00 | Zeil 5, Qata 2yemîn |




Agahiyên din:

Gesundheitsamt Frankfurt am Main

ROBERT KOCH INSTITUT

HEPMIG VORSTUDIE
Versorgungssituation von Hepatitis B und C in Deutschland bei Menschen mit Migration aus ausgewählten Ländern

# Agahî
# Ji bo Xwendekarên

Lêkolîna HepMig ji aliyê Enstîtuya Robert Koch ve bi alîkariya Daîreya Tenduristiyê ya Bajêrê Frankfûrtê pêk tê.

Ev lêkolîn ji aliyê Daîreya Tenduristiyê ya Federal ve tê fînanse kirin.

Sprache: Kurdisch

## Hepatît B, C û D çi ye?

Hepatît B, C, û D enfeksiyonên ji ber vîrusan ne.

Enfeksîyon dikare bibe sedema westandin û aciziya zik, carinan jî dibe sedem zerikê.

Piştî salan enfeksiyonên dikarin rê li ber kansera sîroz û kezebê be û di encamê de bibe sedem mirinê.

Vîrûsa hepatît dikare bi rêya pêwendiya bi xwîna mirovên tûşî bûyî, seksa bêparastin a bi mirovên tûşî bûyî re, yan jî ji dayikeke tûşîbûyî derbasî zarokî bibe.

Enfeksîyon bi serkeftî dikarin werin tedawîkirin û vakslêdan li dijî hepatîta B û D yê leşî diparêze.

## Armanca lêkolîna HepMig çi ne?

Armanc ew e ku em ji bo kesên li Romanya û Tirkiyeyê koç kirine, rê li ber pêşîgirtin û lênêrînê vekin.




## Di lêkolîna HepMig de çi dibe?

**Komkirina xwînê:**

Kesek ji ekîba lêkolînê xwînê ji tiliya te yan jî rehê we distîne û dişîne laboratuarê. Ji bo hepatît B, C û D xwîn tê test kirin.

**Pirsname:**

Em jî ji we dixwazin ku hûn pirsên li ser tenduristî, gihîştina tenduristiyê, û faktorên rîsk ên gengaz bibersivînin.. Tu dikarî vê li ser tableta me yan jî li ser kaxizê bikî. 15-20 deqîqeyan didome.

Pirsname di zerfeke mohrkirî de bi şîfreya serxet an jî ji RKI'yê re tê şandin.

## HepMig li ser çi lêkolîn dike?

Lêkolîna HepMig lêkolîna hepatîta vîrûsên B, C û D ye.

Vîrûsa hepatît bi taybetî li hin welatan, ku Romanya û Tirkiye jî di nav de hene, gelekî zêde ye. Armanca lêkolîna HepMig ew e ku kesên ku li Romanya û Tirkiyeyê ji dayik bûne çiqasî bin bandora vîrûsê ne û lêkolîn bikin ka xizmeta tenduristiyê li Elmanyayê çiqasî radest wan bûne.

## Kî dikare di lêkolîna HepMig de beşdar bibe?

- ✓ Temenê te herî kêm 18 salî ye.
- ✓ Li Tirkiye yan jî Romanyayê ji dayik bibin.
- ✓ Tu hê di vê lêkolînê de beşdar nebûyî.

Wê demê tu dikarî beşdarî lêkolînê bibî.

Beşdariya li lêkolînê bêpere û dilxwazî ye. Di çarçoveya vê lêkolînê da hemû agahîyên ku em dikin, bi awayekî teqez bi awayekî veşartî dihên tevger kirin.

## Gelo beşdarbûn bi dilxwazî ye?

Belê, beşdarbûn bi temamî dilxwazî ye. Eger tu nexwazî beşdar bibî dê tu zirarê nabînî.

Eger hûn bixwazin beşdar bibin, destûra xwe ya nivîskî bidin me. Ji bo vê yekê, pêdivî ye ku hûn agahdariyek razîbûnê îmze bikin.

Eger hûn nexwazin duv re beşdar bibin, hûn dikarin bêyî sedemek û bêyî ku zirar bigehe we, di her demê da ji razîbûna xwe paşve bikişînin